Kurege yarû wext bawgê senist

Pîyagig dîrwext, şeket le karew hat ew düya erê maL. Le der maL kur penc saLey eray wisagî.

-Bawge! Yek sual elid dîrim, bipirsim?

-Elbete, çe sualig?

-Bawge, erê her saet kar çenig pül e pêd ediryê?

-Bawge we tin u têjî (esebî) cûwaw da: Ye çe bawetê (rebt) we tu dîrê? Era haçne sualig le me epirsid?

-He bes exwazim bizanim, büj eram erê her saet kar çenig pül e pêd ediryêd?

-Er bayed bizanid, 20 $.

Kure büçig, ser we xwar, ahig kîşa. Düyay nürist e bawgê u wet:

-Edê 10 $ e lêd we qert bûwem?

Bawge qînew (firye esebî) bü u wet:

-Er bûney (sebeb) pirsînid ye bü ke bes bitwayd pül erê esbab bazî elim besenid (bûweyd), we zü biçû erê utaqid (ghurfe). Erê xwed binîş fikr bike, era îqerge xwedpesenid!

Me her rûj le kar gîyan ekenim, hewseLê î kirdar minaLanede neyrim!

Kure büçge, aram çü erê utaqê u der le xwey wisan.

Pîyag erê xwey nişt u he qîntir u qîntirew bü:

-Hay kurime çün etwanê lêfene sualig le me bipirsê?

Düya saetig pîyag aramew bü u le kirdarê tin u têjê xwey peşîmanew bü. Şayed kurê we rasî atac 10 $ daştê!

We tenanet ye ke kurê firye kem dûwa çişt elê ekird. Pîyag çü ew rê utaq kurê u derege waz kird.

-Kurim, xeftide?

-Ne bawge, ham e xewer.

-We gumanim rewiştim (kirdarim) gen bü welid. Imrû karim sext u dirêj bü u her narahetîg daştim le serê tu petî kirdim. Bê ye 10 $ ke le me xwastîdê.

Kurege nişt, xenist u qîjan:

-Memnûnidim ba.

Düyay kurege des bird e jêr baLiştê u cigê pül le jîrê erawird. Pîyag ke dî kuregey xweyiş pül daşt, eLbûqya u we qîranin wet:

-Er tu xwed pül daştid, era le minîş pül xwastid?

Kure cûwaw da:

-Erê ye ke pülim bes nakird, imca yeme ekad. Me îse 20 $ dîrim. Etwanim yek saet le wextid bisenim ta sû zütir le kar bîyeyd e rê maL?

Dûs dîrim şêw welid buxwem

Seywan Qember (www.feyli.se)